

## Kê bextewer e?

Ji dema ku ev mirovê nefretlêkirî ji bihuştê hatiye derxistin û şandin ser erdê ve, ew li pey tiştekî ku navê daniye bextewerî digere ku jê re digot Bextewarî hîn jî ne diyar e, ew çi ye, çawa tê ravekirin û çi pênaseyekê bidinê.

Dom»R:10





## Hundirnasiya nasyonalîzmê

Nasyonalîzm yek ji bihêztirîn hêza hundirî, civakî û siyasî li dîroka modern a mirovahiyê ye. Nasyonalîzm ji aliyekê dikare vekhevî, şanaziya netewî û tebayiya civakî biafirîne û ji aliyek din ve jî dikare çarçoveya tundûtîjî, cudatîdanîn û şer be. Têgihîştin ji kok û bingeha hundiriya nasyonalîzmê, rê dide me netenê wek îdeolojiyek, belku wek diyardeyek hundirî-civakî lêkolînê li ser bikin.

Dom» R:3

*Bidesîveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (495)05-06-2025Buha (1000) Tûmen*



## Rejîma Îranê û siyaseta terorê

Komara Îslamî ya Îranê bi kiryarên terorîstî, girtin, îdamkirin û tunekirinê li dijî neteweyên bê maf, bi taybetî Kurd û Baloch, tê nasîn.Di heyama 45 salan de, li her qada siyasî, civakî û çandî de Kurd negeheşiye mafên xwe, û berdewam rastî siyaseta teror, girtin û îdam hatiye.Parlamentoya Ewropayê jî IRGC (Spaha Pasdaran) bi sûçê tepeserkirina nerizayetî û xwenîşanderan, girtin û îdamkirina ciwanan wek sebebkarê komkujî û terorê destnîşan kir.

Dom» R:9

# Welat, Welatînî û Al



Welat, erdê bav û kalikên me ye.

Welat ew der e ku, pêşîyên me li wê rabûne, Ji bona avahiya wê xebitîne û li wê mirine. Welat ew diyar e ku, em têde sekinîne û rojekê di nav axa wê de bêne veşartin.

Xelkê welateki, welatiyên hev in, Borî, hal û dawiya wan bi hev re girê dane. Zmanê wan, girêdana wan, her hal û lebtên wan mîna bev in. Pêşiyên wan li rex hevdu rabûn, rûniştin û mirine.

Welatî bi qencîya hev şa dibin, ber xirabîya hev dikevin. Şîn û şahiya wan yek in.

Xelkê welatekî brayên hev, pismamên hev in. Hergav bi hev re, dest bi dest, ji bona xweşî, avahî û azahîya welatê xwe dixebitin, armanca wan yek e. Ji bona welatê xwe can û malên xwe didin der, xwîna xwe bêperwa dirêjînin. Herê dixebitin ku welatê wan ne kevie bin destên miletên din.

Lê milet hene ku welatê wan, bi awakî, ketiye bin destên neyar û dijminan. Wek welatê miletê me, Welatê Kurdistanê. Ev miletên ha ji bona rizgarîya welatê xwe dixebitin. Xebata wan ev e: Rojekê berê biyanîyan ji welatê xwe derînin û mîna miletên din biserxwe bibin, di nav hev de bi xweşî, û bi qencî bijîn.

Herkes hej welatê xwe, hej welatîyên xwe dike. Hejêkirina welêt di dilê me de hêvîyeke mezin û bilind e. Em pê xurt, mezin û canfeda ne. Jê re welatînî dibêjin..

Welatînî di hundirê me de agirekî pîroz e. Pêta wî agirî ji me re her tiştên welêt dide hez kirin. Ji lewre, di ber çavên me de ax, av, çiya deşt, dar û kevirên welatê me ji yên welatên din spehîtir, xweştir û şîrîntir in.

* * *

Her milet xweyîyê Alekê ye. Al nîşana milet û welêt e.

Tevahiya heyîna miletan di ala wan de civiyaye. Al keramet, rûmet û bextê miletan e. Zarokên her miletî ji bona bilindî û bi qedrbûna ala xwe, bêperwa xwe didin kuştin.

Ala her miletî je re beha ye. Di cejn û sahinetan de kesr, seray, xanî û kuçeyan pê dixemilînin, di ber wê re diborin, slivan lê dikin, wê maç dikin, datînin ser serên xwe.

Alên miletên bi serxwe, di ser kelat û bajarên wan re li pêl dibin, di rêveçûna leşkerî de divekin pêşîyê.

Lê alên miletên dîn, wek ya miletê me, ji her derê biderkirî, lihevtewandî li ser' dilê zarokên wan de hilandî ne.


Miletên dîn dixebitin, xwîna xw dirijênin ku biyaniyan ji welatên xwe biqewirinin û alên xwe li ser kelat û bajarên xwe ji nû ve daçikînin.

Ala her miletî bi çend rengan û bi şiklekî din e. Ala kurdan, ji jor ber bijêr ve, ser hev, sor, sipî û kesk e, di nava wê de roj diçirise.



## Bi sînemaya çewt, nikarin pêşmerge lekedar bikin

Dom » R:6



## Gola Urmiyê ber bi jinavçonaê ve diçe

Dom » R:8

# Peyama Deasteya Kargêrî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 12ê Cozerdan, roja girtiyên siyasî yên Kurdistanê




**Girtiyên siyasiyên serbilind û xweragir!**

**Malbatên xebatkar û xweargir ên girtiyên siyasî!**

**Xelkê xebatkar ên Kurdistanê!**

Çend saleke ku roja 12ê Cozerdanê wek roja girtiyên siyasî yên Kurdistanê hatiye navdêrkirin. Li 12ê Cozerdana 1362 a Rojî de celladên rêjîma komara îslamiya Îranê, li bajarê Tewrêzê de bi encamdana cinayet û tawanek bêmînak, 59 ciwanên xeilkê bajarê Mihabadê bi tawana xebat li pêxema mafê netewî û siyasî û tohmeta hevkarî digel Hizbên siyasî yên Kurdistanê, bikom êidam.

Li vê hilkeftê de yada wan ezîzên xebatkar ên jidestçoyî de em silavan bo rihê paqijê wan dişînin û rêz li xebat û xweragiriya hemû girtiyên siyasî yên tevgera Kurd li Rojhilatê Kurdistanê digrin.

Bêguman girtiyên siyasî yên Kurd hêmaya serîneçemandin û xweragiriya gelekê ne bo azadî, dêmokrasî û serwerîxwaziya Kurd. Girtiyên siyasî yên Kurdistanê li vê pêxemê de girtin, azardan û îşcekirinan nekarî serê wan biçemîne û bi îradeyek polayî li hember sitekmaran de sekinîn.

Wan reşçal û girtîgehên rêjîma komara îslamî kirine çepera xebat û xweragiriyê û Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li vê rojê de silavan bo canê paqijê hemû şehîdên doza azadî, bi taybet hemû şehîdên girtiyên siyasî dişîne û li hember meznahî, xweragirî û liserpêxwemana girtiyên siyasî, bejna xwe ditewînin.

Li cinayeta 12ê Cozerdanê ya 41 salan berî niha de, şêwaza girtina wan 59 xebatkarên siyasî, lêkolînên ji wan li jêr îşkenceyan û şêwaza dadgehîkirina wan û êidama wan a bi kom û herwisa bêserûşûnkirina termên wan, mînakek xuya li reftara rêjîma komara îslamî digel neraziyan û dijberên siyasiyên xwe li girtîgeyhan de bûye ku heta niha jî li derheq xebatkarên siyasî yên Kurd, berdewam e.

Hevdem digel vê tawana bi sam, nîşaneya siyaseta qirkirina sîstematîk ya çandî û fîzîkî ya rêjîmê li dijî gelê me ye.

**Welatiyên xoşewîst!**

Komara îslamî ji destpêka hatinaserkarê xwe ve bi milîtarîzekirina Kurdistanê û destavêtin bi hemû cure serkutkirinek, ji girtin, bidarvekirin û sepandina sizaya girgîgehê bo ser mafxwazên Kurd ve heta terorkirina rêberan, kadr û pêşmergeyan, bombebarankirina deverên avedan, talankirina çavkaniyên sirûştî û hewldan bo helandin û asimîlekirina çandî û berfirehtirkirina diyardeyên zirarder ên civakî, Hewl daye îradeya gelê me bişkêne.

Binpêkirinên eşkere û xuya û berdewam a mafên mirovî li Kurdistanê, siyaseteke armancdar bo fetisandina dengê mafxwazî û azadixwaziya gelê me bûye.

Mixabin ku civaka navnetewî û hêzên cîhanî jî, helwîsta bi wec û hewce li hember wan tawankarî û cinayetên rêjîma Îranê li pêş xwe negirtine û berjewendiyên demkî yên siyasî û aborî, serwetir ji nirxên mirovî danîne.

Rêjîma Îranê jî bi peydakirina vê derfetê û bikaranîna xirab a vê rewşê, tawankarî û cinayetên xwe bi taybet tepeserkirina xelkê li Kurdistanê, berfirehtir kiriye. Tevî vê yekê jî dîrok şahidiyê dide ku gelê Kurd û xortên têkoşerên vê, ti car teslîm nebûne.

Girtîgehan neku her nekariye îradeya polayî ya têkoşerên Kurd bişkêne, belku wan girtîgeh kirine çepera berxwedanê û navenda pêgihandina nivşa hişar û micid li ser gihîştin bi azadî û mafên netewî.

Şandina tejî seh a ciwanan bo girtîgehan û pêşwazîkirina hemasî li wan li dema azadkirinê de belgeya vê rasiyê ye ku gotara xweragirî, bi ser gotara teslîmbûnê de bi ser kevtiye û hêviya paşerojek rohn li dilê xelkê Kurdistanê de zindî kiriye.

**Girtiyên siyasî ên mêrxwas!**

We bi xweragirî û li jêr hemû êş û azar û îşkenceyên hundirî û fîzîkî de alaya xebat bo azadiya Kurdistanê bilind ragirtiye û rohnîderê hemû xebatkarên doza azadî û mînakên bilind ên pêbendî bi armancên gelê xwe ne.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, rêz ji xebata ve digre û xweragira ve bi zaminê berdewamiya xebat û mizgînîderê serkevtiuna dawî dizane.

Desteya Kargêrî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistanma Îranê, tevî dubarekirina soza xwe digel armancên bilind ên şehîdên doza azadiyê bi taybet şehîdên 12ê Cozerdanê û bi ragihandina spas û pêzanîna dubare li xweragirî û taba malbatên girtiyên siyasî, xatircem e ku xwîna şehîdan û jankêşana girtiyên siyasî dê bigîhîje encamê û gelê Kurd li Kurdistanek azad û demokratîk de mafên xwe yên binpêkirî, bi derst ve bîne.

**Silav li rihê paqijê şehîdên doza azadiya Kurdistanê!**

**Bilind û pîroz be, yada hemû girtiyên siyasî, ew qehremanên bê navûnîşan û navdarên gel!**

**Her bilind be xebata mafxwazaneya gelê Kurdistanê!**

**Hiuzba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**Desteya Kargêrî**

**11ê Cozerdana 1404 a Rojî**

# Hundirnasiya nasyonalîzmê



N. Bêhgzad Qadirî
W. Bêhzad Simko

Nasyonalîzm yek ji bihêztirîn hêza hundirî, civakî û siyasî li dîroka modern a mirovahiyê ye. Nasyonalîzm ji aliyekê dikare vekhevî, şanaziya netewî û tebayiya civakî biafirîne û ji aliyek din ve jî dikare çarçoveya tundûtîjî, cudatîdanîn û şer be. Têgihîştin ji kok û bingeha hundiriya nasyonalîzmê, rê dide me netenê wek îdeolojiyek, belku wek diyardeyek hundirî-civakî lêkolînê li ser bikin.

**Pênaseya nasyonalîzmê ji dîtingeha hundirnasiyê ve**

Nasyonalîzm pêkhatiyek ji îdeolojî an sehek kûr a girêdayî bi neteweyekê ye ku girêdayê bi bawerek ji serdestiya netewî, mafê serwerî an serbixweyî ye.

Nasyonalîzm, girêdanek hundirî bi neteweyekê ye ku renge bi rêya hizir û bawerî li derheq serdestiya netewî û mafê serweiya siyasî, xwe bide nîşandan.

Li hundirnasiya civakî de nasyonalîzm wek curek ji nasnameya bi kom tê pênasekirin, ev rêbaza tekezî bi ser vê yekê dike ku mirov hewcehî bi hogirî û girêdanekê ve heye û "netew" yek ji girîngtirîn girûpên çavkanî bo pêkanîna nasnameyê ye.

Nasyonalîzm pêkhatiye ji sehkirin bi girêdayî û emegdarî bo netewek ku gelek caran sehkirina bi serdestiyê bi ser girûpên din de li pey xwe tîne. Ev seha dikare yekgirtina civakî li nav girûpan û dijheviyên li hember girûpên derve an biyanî, bihêztir bike.

Ji hizirgeha teoriyên nasnameyê ve, nasyonalîzm wek bersivek hundorî bi hewcehiya mirov bi hebûna sehek êmin bo xwe, li cîhanek aloz û neewleh de ye.

Nasyonalîzm şêwazek ji pêkhateya nasnameyî ye ku kes xwe digel netewek an etnînekek diyarîkirî de dide nasandin, bo vê yekê ku seha bi dom, yekîtî û mana û wate li jiyanê de peyda bike.

Nasyonalîzm, ji pêkhatina "nasnameyek siyasî-emegdarî" hatiye avakirin ku tê de kes, netewê wek çavkaniya bingehîn a rewatî, nirx û mana û wateya dibîne û amadeye li pêxemê de nirxê jî bide, heta bi nirxa tundûtîjî û qurbanîdanê jî.

**Aliyên hundirî yên nasyonalîzmê**

Nasnameya civakî û nasyonalîzm, pêka teoriya nasname ya civakî, nasyonalîzn kok û binyata vê li xwesta mirov bo girêdayîbûn bi girûpekê de heye. Kes bi netewê xwe pênase dike û xwe digel "ên din" berewrid dike, cidatiya em\ evên din, dibe sedema sehkirin bi serdestî û hinek car jî dibe sedema dujminiya digel girûpên din.

She û kelêjana girûpî, kelêjan û sehên wek şanazîkirina netewî, biçûkkirina biyaniyan, kerb li hember gefên derve û sehkirin bi qurbanîbûn, li bihêzkirina nasyonalîzmê de gelek bi bandor in. Ev seh bi rêya ragihandinan, rêberên karîzmatîk an perwerdeya netewî ve têne geşkirin.

Hewcehî bi yekîtiya hundirî, kesên ku bala wan gelek bo aliyê alxahîniya hundirî û rêkûpêkî û serûberbûna hizrî hene, zêdetir hogirî bi îdeolojiya nasyonalîzmê ve hene. Nasyonalîzm çarçweyek bi wate û manadar bo têgihîştin ji cîhanê pêşkêşî wan dike.

Narsîstiya bi kom, curek ji xwebimezinzanîna girûpî ye ku pêywendî bi sehek tund li hember gefên derve û hewcehî bi geşekirina berdewam a girûpî heye. Ev diradeya dikare çarçoveya dujminatî li hember penaberan, kêmîneyan an dewletên din çê bike.

**Curên nasyonalîzm ji dîtingeha hundisnasiyê ve**

- Nasyonalîzma medenî, girêdayî bi netewê li ser binyata nirxên hevpar û beşdariya siyasî
- Nasyonalîzma netewî, girêdayî bi netewê li ser binyata tixm, xwîn, ziman û çand.
- Nasyonalîzma berevanîkirin, bersiva bi she li hember gefa derve an sivêkatîkirina dîrokî.
- Nasyonalîzma êrîşkar, banghêjiya ser tirbûn serdesî bi ser netewên din de.

**Rola ragihandinê li hundirnasiya nasyonalîzmê de**

Ragihandin û serkirdeyên siyasî bo bizivandina seha nasyonalîstî, li hêma û sembolên netewî, bi bîranîn



bi kom û baskirin ji " em li hember evan", mifahê verdigrin. Ev prose dikare hem bo bihêztirkirina hevdengî û hem bo handan bo tundîtîjiya netewî bê bikaranîn. Wek mînak: "Propagandayên siyasî li serdema şerê yekem û duyem ên cîhanî de ragihandinên dewletên tevaviyetxwaz de û gotara nasyonalîstî de li dema hilbijartin an li kirîzan de".

Pêka hundornasiya nasname, ragihandin bi nîşandana berdewam a hêmayên netewî, welat, ala, qehremanên dîrokî û sînorên dujmin\ dost, li avakirina nasnameya netewî li hizra temaşevan de rolek giring hene. Wek mînak, nîşandana berdewam a wêneyên şehîdên welat, ostûreyên netewî an mûzîkên netewî li têlêvîzyonan de, seha girêdana netewî û hindirî diafirîne.

Ragiahndin dikarin seh û xemên girûpî, wek şanaziyek netewî, kerb li hember biyaniyan, tirs ji gefên derve an hevxemî bo êş û derdên netewî çê bike, bi vê yekê, berteknîşandanên nasyonalîstî, bihêztir bike.

Li hundirnasiya civakî de, gelek caran nasyonalîzm bi sehên em li hember evan" tê bihêzkirin, ragihandin wan sînorbendiyane bêtir dide xûyakirin.

Li serdema înternetê de, torên civakî bûne pêgehek nû bo berhemanîna nasyonalîzmê, mirovên asayî dikarin bi belavkirina naverokek ku ala, sirûda netewî, sivikatîkirin bi kesên din, an handana seha bi kom li xwe bigre, li berhemanîna nasyonalîzmê de beşdar bin.

Niha nasyonalîzma elektronîkî, yek ji warên nû yên lêkolînê li hundirnasiya siyasî ye.

**Rola perwerde û hînkarî li geşedan bi nasyonalîzmê**

Kultûr, sîstema perwerde, dîroka fermî û hêmayên giştî li geşedan bi nasyonalîzmê de rolek berçav hene. Hundirnasiya geşeya civakî, dide xuya ku girêdayêbûn û hogiriya netewî ji temenê zarokatiyê ve û bi rêya ala, sirûd, Çerokên dîrokî û çêkirina dujmin ji yên din berhem tê.

Li gelek ji welatan de bernameyên xwendingehan pêktê ji hînkarî dîrokî ya niştimanî, cografiya, wêje û zimanê fermî yê welat. Ew perwerdeya bi tekezkirin bi ser qehremanên dîrokî, bûyerên bi şan û gefên dîrokî ji aliyê biyaniyan ve, seha nasyonalîzmê li hundirê zarokan de bihêz dike. Wek mînak, perwerdayên li derheq, şoreşan, şeran an serkevtinên dîrokî, bi armanca çandin a "şanaziya netewî", tê kirin.

Xwendingeh bi hînkirin û nîşandana berdewam a hêma û sembolên wek sirûda netewî, ala, rêûresmên netewî û kesayetiyên avakerên welat, curek ji tovê nasyonalîzma sembolîk li hizra zarokan de diçîne. Her li qonaxa destpêkî ve dema sirûda netewî tê strandin, dibe xwendevan rabe ser pêyan û silav li ala yê bike, ew jî hêdî hêdî, bersivek emagnasî û nasnameyî bo wan hêmayan, li hizra wan de diafirîne.

**Encam**

Hindirnasiya nasyonalîzmê vê yekê bi me dide nîşandan ku nasyonalîzm bi tenê gotarek siyasî nîne, belku diyardeyek kûr a hundirî ye ku bandorê li ser têgihîştin, seh, nasname û biryardana mirov de heye.

# MIJAR: HEVKARÎ, TIFAQ Û YEKITÎ



N. Cano Amedî



**Beşa 2**

Daxwazên millet, pêwîstî û ferzkirina dîrokê li alîyekî; egoya (ezezîya) "Abêyan", berjewendîyên hizbî û grûbî, konforên demkî, bêbiryarî û bêbawerîya kadroyên tênegihiştî, li alîyekî din paradoksek derdixe holê.

Gava em li ser rojevek hevbeş û li ser daxwazên netewî nikaribin bersîva pêvajoyê bidin, li wir pirsgirekên mezin heye. Divê sîyaseta kurdî cardin bi hişmendîya netewî, li gor pîvanên berjewendîyên netewî hewl bide, tevbigere û bi hevra rêyek nû peyde bike. Lê dîsa jî ev mijareke pir aloz e û gelek aliyên din jî hene ku bandorê li ser vê rewşê dike.

Ji bilî faktorên konjektora dunyayê (faktorên derva û yên hûndir) gellek sedem hene ku tesîrek negatîf li ser tevgerên Kurdî dike. Yek ji wan sedeman ew e ku bêhêzbûn û ji armanca azadîya Kurdistanê dûr ketin jî, tesîreke negatîf li pêknehatina tifaqan dike. Dijberî û bêdîyaloga navbera alîyan jî tesîrek xirab li ser sîyaseta kurdî dike.

Di derbarê mijara yekitî û tifaqan de pêwîstî bi rexne û nirxandinên cuda heye! Her mijar bi serê xwe cihê nivîsekê ye. Mînak "yekitîya sîyasî û rêxistinî", "tifaqên neteweyî yên stratejik", "hevkarî û hevxebatên demkî" mijarên cuda ne; lê bi şêweyekî bi hev girêdayî ne. Ji ber wê yekê divê cuda cuda bê nîrxandin. Her mijar bi serê xwe cîhê nivîsek cuda ye.

Em dizanin ku ji bo hevkarî û tifaqa nav kurdan, pêwîstî bi gelek faktorên bingehîn heye. Ev faktorên hanê li gor demê, li gor konjonktura dunyayê û li gorî demsalên sîyasî tên guhertin. Berîya her tiştî divê hemû alîyên Kurdî li ser armancek hevbeş, sîyasetek milî, stratejîyek netewî li hev bikin.

Ev armanc dikare parastina mafên kollektîf yên kurdan, bidestxistina statûyek siyasî (otonomî, federalîzm, an serxwebûn li gorî rewşa her parçeyî), an jî pêşxistina çand û zimanê kurdî be. Gava ku armancek hevbeş hebe, ew mekanizma dikare bibe bingeha yekrêzîya mala Kurdî.

Pêwîstî bi lihevkirinek ser prensîbên bingehîn heye. Ev prensîb dikarin bibin çarçoveyek ji bo xebata hevbeş. Divê her aliyek kurd bikaribe rêzê li hebûna aliyên din bigire û berjewendiyên neteweyî li pêş berjewendiyên partîperestîyê bigire. Ev helwest û hewlên milî dikare ji bo avakirina atmosfereke bawerî û rêzgirtinê bingehekê ava bike.

Şert û mercên îroyin û dîroka nêzîk dide nîşandin ku pêwîst e aliyên kurdî ji dîrokê ders bigirin û ji dubarekirina xeletî û şaşîyan xwe dûr bixin. Analîzkirina pêvajoyên derbasbûyî, sedemên neserkeftina hewlên berê yên yekbûnê, dikare rê nîşanî hewlên nû bide. Ji bo tifaqek serkeftî pêwîstî bi temsîlkarîyek giştî û mekanîzmayek berpirsiyariya biryarên hevbeş bigire heye. Divê ev temsilkarî şefaf û hesabdar be ku cardin xeletî û kêmasîyên doyin dubare nebin!

Bi hişmendî û hestên niştimanperwerî avakirina platformek hevbeş a siyasî dikare bibe sîwanek giştî ku hemû aliyên kurd bikaribin nêrîn û daxwazên xwe tê de diyar bikin; dikare bibe gaveke girîng bo yekrêzîya mala Kurdî. Ev platform dikare bibe cihê diyalog, lihevkirin û hevkarîyên mayînde.

Hevkarî ne tenê di warê siyasî de, di warên çandî, aborî, û civakî de jî girîng e. Projeyên hevbeş di van waran de dikarin nêzîkbûna di navbera aliyan de xurtir bike û sînerjîyek milî derxe holê.

Îro raya giştî, hemû beşên civatê daxwaza yekrêzîya mala Kurdî dikin. Divê hemû alîyên kurd vê rastîyê û daxwazên civatê bibine û rol û barê xwe hilgirin. Ji bo herkes erkê xwe bi cîh bîne pêwîstî bi teşwîqkirin û zextên civatê heye. Pêşengîya wî jî divê rewşenbîr û pêşengên civatê bikin û berpirsîyarîya xwe hilgirin, pêwîstî û girîngîya yekbûnê di rojevê de bigirin.

Dema ku civat daxwaza yekbûnê bike û piştgiriyê bide hewlên di vî warî de, zext li ser partiyan zêde bike, hemû alîyên kurdî wê mecbur bimîn ku bo hevkariyê gav bavêjin. Rewşenbîr, zanist û niştimanperwerên dilsoz bi piştgirîya civatê dikarin rê li ber tifaq û yekîtîya sîyasî xweştir bikin û alîyên ku yekîtîyê dixwazin xurt bikin, weke navend teşwîk bikin.

Ew alîyên ku astengîyan derdixin jî bi rexne û pêşnîyarên xwe asteng bikin û wan teşwîkî xebatên hevbeş bikin. Ji bo serkeftin û pêşveçûnên mayînde jî pêwîst e ku di navbera aliyên kurd de diyalog û danûstandinên berdewam hebin. Ev diyalog divê vekirî, durust û bi armanca çareserkirina nakokiyan û ji bo destxistina armancên giştî be.

Em weke PWK, di warê yekitîya sîyasî û rêxistinî de jî, di tifaqên neteweyî yên stratejîk û hevkarî û hevxebatên demkî de jî, ji partîyên din cuda ne. Me di heman deman de gotîye û dibêjin: Berjewendîyên giştî yên netewî ji bo me esas e. Partîya me, rêvebirî û hemû hewldanên me yek ji wan pergalên têkoşîna doza Kurdistanê ye. Em tu carî berjewendîyên partîya xwe li ser berjewendîyên netewî nagirin û rê nadin ku av şêlû bibe.

Bi kurtî, ji bo hevkarî û tifaqa nav kurdan pêwîstî bi armancek hevbeş, prensîbên lihevkirî, rêzgirtina ji hevre, bi piştgiriya civatê û bi diyalogek berdewam heye. Em baş dizanin ku ev pêvajoyeke demdirêj e û pêwîstî bi fedakarî, hişmendîyek kollektîf û jidilîya hemû alîyan heye.

Di warê yekîtî, tifaq û hevkarîyan de em wekî PWK xwedî hişmendîyek çêker in. Di pratîk û gotarên xwe de, me ev rêgeh ava kirîye û em her tim bal dikşînin ser vê rêbazê: "Yên dikarin di nav yek partîyê de bibin yek bila bibin yek; yên nikarin di nav yek partîyê de bibin yek, divê hevkarî û tifaqan bikin; yên nikarin hevkarîyan bikin, bila di nav dîyalogê de bin; yên nikarin di nav dîyalogê de bin jî, bila dijminatîya hev nekin!"

Em hemû baş dizanin ku di warê jiyana olî, sîyasî û civakî de Kurdistan hêlîna bihevrejiyanê ye. Ji ber wê yeke em dibêjin hemû pêkhatî û hêzên kurdistanî divê di qada têkoşînê de jî, bi armancek hevbeş tevbigerin û bi şêweyekî lezgîn wargeha tifaq û hevkarîyan çalaktir bikin û derfetên derketine holê baş binîrxînin ku cardin "hespê felekê"

# Ji Çiyayan Ber bi Dîplomasiyê – Destpêka Qonaxeke Nû di Dîroka Neteweya Kurd de



N. Dr . Mecîd Heqî

**Beşa 2**

Ji aliyekî din ve, dîyasporaya Kurdî - bi taybetî li Almanya, Swêd, Fransa û Keyaniya Yekbûyî - bi saya lobiya bi bandor, medyaya pirzimanî, sendîkayên karker û hebûna li parlementoyên herêmî, kariye pirsgirêka Kurdî bigihîne asta siyaseta giştî ya Ewropî. Ji sala 2016an vir ve, zêdetirî çil biryarên piştgiriya xweseriya gelê Kurd di saziyên qanûndanînê yên Ewropî de hatine pejirandin.

Ev kapasîteya dîasporayê bûye yek ji girîngtirîn leverên zexta nerm li ser hikûmetên Tirkiye, Îran û Iraqê, û pirsgirêka Kurd veguherandiye pirsgirêkek rewa, demokratîk û cîhanî.

Analîzeke rastîn a bandora hilweşandina PKKê bêyî têgihîştina çarçoveya krîtîk a siyaset û aboriya Tirkiyeyê ne mimkûn e. Ji ber ku ev biryar ne di valahiyekê de, lê belê di siya zextên zêde yên li ser hikûmeta Erdogan de mantiqî ye.

Di salên dawî de, Tirkiye bi enflasyona du reqemî, kêmbûna bêhempa ya nirxa lîreyê, reviyana sermayeyê, kêmbûna rezervên diravê biyanî û bêkariya bilind re têdikoşe.

Yek ji sedemên avahîsaziyê yên vê krîzê, lêçûnên mezin ên şerê hikûmeta Tirkiyeyê li dijî gelê Kurdistanê û tepeserkirina sîstematîk a daxwazên gelê Kurd e. Li gorî raporek Navenda Lêkolînên Stratejîk a Tirkiyeyê, tê texmînkirin ku lêçûnên şerê li dijî PKKê ji sala 1984an vir ve ji 300 milyar dolarî derbas bûne, ku ji bilî barê darayî yê rasterast, bûye sedema sekinandina pêşkeftinê û valahiyek aborî di navbera rojava û rojhilatê Tirkiyeyê de.

Bêparkirina Kurdistan ji xizmetguzariyên binesaziyê, perwerde, tenduristî û kar, li bakurê Kurdistanê cureyek marjînalîzasyoneke avahiyî afirandiye. Ev yek rewatiya hikûmeta navendî di nav çînên jêrîn û neteweyên bindest de bi giranî qels kiriye, û bûye sedema derketina berxwedana sivîl û siyasî ya berdewam.

Di rewşên weha de, hilweşandina PKKê dikare ji hêla hikûmetê ve wekî gavek ji bo paqijkirina cihê ji bo pevçûna leşkerî were şîrove kirin; Lê ji perspektîfa tevgera rizgariyê ve, ev "derfeteke vekirinê" ye bi şertê ku li şûna mîlîtarîzmê, reformên bingehîn û beşdariya rastîn a hemû gelên ku li Tirkiyeyê dijîn di rêveberiyê de werin rojevê.

Faktoreke din a ku atmosferek ji bo ji nû ve nirxandina polîtîkayên hikûmeta Tirkiyeyê afirandiye, şertên endametiya potansiyel a di Yekîtiya Ewropayê de ne. Ji salên 2000an vir ve, Yekîtiya Ewropayê bi berdewamî tekez kiriye ku reformên di warên mafên kêmneteweyan, mafên mirovan û rakirina qedexeyên zimanî û çandî de ji bo tevlîbûna Tirkiyeyê di vê saziyê de şertên pêşîn in.

Bi qelsbûna pozîsyona Erdogan di hilbijartinên herêmî yên 2024an de û bi serketina hêzên opozisyonê li bajarên wekî Stenbol, Enqere û Amed, perspektîfa aloziyên siyasî û zextên ji jêr ve ji bo guhertinên rastîn derketiye holê. Hilweşandina PKKê di rewşek wisa de dikare wekî "pêşniyarek aştiyê ya dîrokî" ji civaka navneteweyî û Yekîtiya Ewropayê re were pêşkêş kirin.

Hilweşandina fermî ya PKKê ne tenê bûyerek e ku bi bakurê Kurdistanê (Tirkiye) ve girêdayî ye. Ji ber statuya transneteweyî û seresazî ya vê rêxistinê, ev pêşketin dê bandorên kûr li ser tevahiya erdnîgariya Kurdistanê bike: ji Kobanî heta Şengal, ji Qele Deze heta Mehabadê. Her beşek ji Kurdistanê, bi taybetmendiyên xwe, dê bi awayên cûda lê bi beşên din ve girêdayî bertek nîşanî vê pêşveçûnê bide.

Li Rojhilata Navîn, ku rêziknameya siyasî ne li ser demokrasiya sazûmanî hatiye damezrandin û avahiyên dewleta neteweyî pir caran li ser înkar, tepeserkirin û dûrxistina yên din ava dibin, rastiya dijwar ew e ku neteweyek ku ji amûrên parastinê mehrûm be, dê li hember otorîteran bêparastin be.

Ezmûnên dîrokî yên gelê Kurdistanê, tevî komkujiyên salên 1980an li Iraqê, wêrankirina bajaran li Tirkiyeyê, û tepeserkirina berdewam li Îran û Sûriyeyê, hemî nîşan didin ku li vê herêmê "bêçekbûn" tê wateya "bêparastin" û di gelek rewşan de, pêşgotinek ji bo înkar û wêrankirina kolektîf e.



Ji vê perspektîfê ve, her çend têkoşîna çekdarî wekî stratejiyeke navendî were terikandin û rêya têkoşîna sivîl, dîasporîk û dîplomatîk were şopandin jî, pêwîstiya parastina astek herî kêm a hêza parastinê ji bo pêşîgirtina li dubarebûna trajediyên dîrokî hîn jî dimîne. Li erdnîgariyekê ku hikûmetan her tim hewl dane dijberên xwe bi zorê tepeser bikin û ji holê rakin, tekane zimanê têgihîştî ji bo astengkirinê hevsengiya herî kêm a hêzê ye.

Ji ber vê yekê, ji bo neteweyek wekî neteweya Kurd, ku hîn li tu derverek Rojhilata Navîn nehatiye naskirin û her gav qurbanê nakokiyên di navbera hêzên navendî de bûye, hebûna amûrên parastina xwe ne nîşana tundûtûjiyê ye, lê belê şertek bingehîn e ji bo man, şiyarbûn û gihîştina siyasî. Ezmûnên cîhanî jî nîşan dane ku aştiya mayînde tenê wê demê mimkun e ku hevsengiya hêz û astengkirina hevbeş hikûmetan neçar bike ku çareseriyên adil qebûl bikin.

Li bakurê Kurdistanê, ji bilî çalakiyên xwe yên leşkerî, PKKê stûna rêxistina siyasî, çandî û civakî ya beşek mezin ji civaka Kurd pêk anî. Saziyên wekî KCK (Yekîtiya Civakên Kurd), Meclîsên Gel, rêxistinên ciwanan, medyaya herêmî û navendên çandî hemî rasterast an nerasterast binesaziya civakî ya PKKê ava kirin. Bi hilweşandina vê rêxistinê re, di warê rêxistinê de valahiyek mezin derdikeve holê.

Lêbelê, ev valahî dikare bibe derfetek jî. Civaka sivîl, akademîsyen, jin û hêzên ciwanan dikarin niha bi karanîna ezmûnên berê modelên çalakvaniyê yên ne-vertîkal û torgilokî pêş bixin. Eger qada siyasî vebe, partîyên demokratîk ên Kurdî (wek Partiya Demokratîk a Gelan an jî hevtayê wê yê nû piştî ji kar dûrxistinên dadwerî) dikarin roleke nû di temsîlkirina yasayî û aştiyane ya gel de bilîzin.

Ezmûna xwerêveberiya demokratîk li Rojavayê Kurdistanê li ser bingeha gotar û modela teorîk a PKKê, û bi taybetî jî li ser bingeha ramanên Abdullah Ocalan, hate şekildan. Pêkhateyên leşkerî yên wekî YPG û YPJ, meclîsên gel, edaleta civakî, rizgariya jinan û ekolojiya civakî hemî di vê gotarê de kok digirin.

Hilweşandina fermî ya PKKê di demekê de tê ku jeopolîtîka Rojhilata Navîn ji nû ve tê sererastkirin. Gelek aktorên herêmî û navneteweyî niha fêm kirine ku gelê Kurd li deverên cûda yên Kurdistanê, di nav de li Sûriyeyê jî, dikare ji bo aramiya siyasî, aştiya domdar û pêşkeftinê şirîkên pêbawer be; Alternatîfek ji bo modelên otorîter û tundrew ên wekî rejîma Esed, Talîban, an Komara Îslamî ya Îranê.

Pêşeroja Rojava her ku diçe girêdayî şiyana wê ya ji bo ji nû ve pênasekirina cihê xwe di hevkêşeyên siyasî yên navxweyî yên Sûriye û herêmê de, ji girêdana xwe ya îdeolojîk bi PKKê re, ve girêdayî ye. Eger ev ji nû ve pênasekirin li ser bingeha aqilmendiya siyasî, beşdariya herêmî û pêşxistina avahiyên demokratîk be, Rojava dikare bibe modelek serkeftî ya demokrasiya pirçandî li cîhana Ereb.

# Bi sînemaya çewt, nikarin pêşmerge lekedar bikin



N.Birahîm Çûkelî



Her şoreş û tevgerek rast a netewî an civakî bi rêya dabînkirin û berjewndiya giştî, tê rêkxistin; her vê jî rewşek wiha afirandiye ku heta niha jî xelkê Kurdistanê şoreşê ya xwe bizanin û bi hemû şêwazekê bo bihêztirkirina vê alîkar bin.

Nihêniya vê yekê ku netewek wek Kurd bi îmkanat û derfetên kêm li hember dujminek xedar û teyar disekine û piştî xebatek dijwar û bi xwîn, li encamê de dujmin dişkêne, çavkanî ji du binyatên bingehîn ve digre:

Yekem, daxwaziyên vê netewî digel carnameya cîhanî ya mafê mirov e; Anku dijî biryarnameyên navnetewî nîne, ya duyem jî hebûpna Hêza Pêşmerge ye ku li herdemek hewce bê zanîn, bi her cihek veguhazin û çalakiyê bike, ti hêzek nikare vê bişkêne û ji meydanê der bixe.

Li vê navberê de rêjîma çewtekar a komara îslamî bo jirêderxistina raya giştî li Îranê û lekedarkirin û kirêtkirina rûkê rast ê şoreşvanên Kurd ku bi Pêşmerge tê naskirin û îro sembola berxwedan û rawestan li hember bêdadiyê ye, her dem carekê bi rêya îmkanatên midayiyên xwe ku a herî bihêz a wan sînema û têlêvîzyon e, hewlê bo alozkirina dîrok xapandina xelkê bi taybet nivşa îro dide.

Li rojên derbasbûyî de rêjîma Îranê fîlmek li jêr navê “pêşmerge”bi derhêneriya kesek ê bi navê “Elî Xefarî” û amadekariya “Areş Zeynelxêrî”,î berhem aniye.

Ev fîlma baskirin ji beşek ji jiyana pasdar Seîd Qeharî, piştî dorana şer e.

ew li sala 1358 de li şerê Pawê de digel Çemran ê cinayetkar, beşdarî kiriye û piştre digel pasdar ehmed mutewesiliyan û ehmed kazimî û kesên din li emeliyatên din de li Kurdistanê, cinayet kirine ku piştre li sala 1358 a rojî de her li Kurdistanê de hate kuştin.

Derhênerê vê fîlmê dixwaze navê bi şan ê Pêşmerge bo nivşa niha ya Îranê û bi taybet li Kurdistanê, kirêt û nehez bide xuya.

Aktorên vê fîlmê ku rola pêşmerge dilîzin bi kesên bikuj, rêgir, cinayetkar û çete didîn nîşandan ku her wek dihate pêşbînîkirinê, aliyê kêm li Kurdistanê de xelk amade nebû dema xwe bo mêzekirin bi vê fîlma tejî çewtekarî bi heder bide.

Her ew pêşwazînekirin û temaşenekirina vê jî wiha kiriye ku heta niha jî derhênerê vê fîlmê hawara wî bilind bûye û dibêje ku gelek diraf bo berhemanîna vê fîlmê xerc kiriye lê bê temaşewan maye.

Rêjîma îslamî bo reşkirina navê “Pêşmerge” bi dirêjahiya temenê xwe yê gemar, gelek fîlmên din ên bi vê naverokê berhem anîne, fîlmên wek fîlma “kanî manga” ku li sala 1366 ê, fîlma “Gulha û Gulûlêha” li sala 1370, fîlma “Şûrê Şîrîn” li sala 1388 û çendîn kurtefîlmên çewt ên din.

Heta rewş gihîştiye qonaxekê ku rêjîmê li çend salên derbasbûyî de bo vê yekê ku hêzên xwefiroş li Kurdistanê bo aliyê xwe rabikîşe li bajarê Sinê ku cihê serîhildana dehan hemaseyên Hêza Pêşmergeyên Kurdistanê bûye, kombûnên berfireh bi xercek giran û ecêb bi rê ve bibe ku kesên wek serokê meclîsa rêjîmê, serokê besîc û nûnerê rêberê rêjîmê û hejmarek din ji berpirsên rêjîmê li vî bajarê de beşdariyê bikin.

Kombûnek ku navê kongirê bi ser danîbûn û bo rêzgirtin ji wan caşên ku li yekeyên spaha psdaran de bo serkutkirina tevgera azadîxwazaneya Kurdistanê de beşdar bibûn û hatibûne kuştin bi rê ve ço, ew kombûn a bi deng û diholên zêde li demekê de bi rê ve çoye ku pirsa Kurd lî cîhanê de zêdetir ji her demekê bal û raya giştî bo aliyê xwe rakêşaye û heta pirs bûye pirsek navnetewî jî.

Birêvebirina vê binav kongirê bo çaşên hatinî kuştinê li jêr navê “pîşmergê muselman” de ew jî armanceke din a komara îslamî bo kirêtkirina navê pîroz ê”Pêşmerge” bû, navek ku niha li wêjeya siyasiya cîhanê û îro wek sembola azadîxwazî û sekinîn li hember dîktatorî û zordaiyê tê binavkirin.

Li rastiyê de jî gelek ron û eşkere ye ku girîngtirîn faktera serkevtinên piştî êrîşên DAÎŞê û rakêşana bala welatên herî bihêz bo aliyê xwe, ev navê Pêşmerge bû ku li seranserê cîhanê de navûdengê vê bilind bû.

Li asta navxweî de jî anku li cografiyaya Kurdistanê bi tenê bese ku awirek li Newroza îsal li Rojhilatê welat bidin; Newroza Xakîpoşan ku tê de xelkê kincên xakî li xwe kirin û axabanî avêtin stuyê xwe, remza xoşewîstî û hezkirina wan li Pêşmergê Kurdistanê bû.

Cem xelkê Kurdistanê, Pêşmerge kesek e ku li pêxema bîr û bawer û armancên mirovî yên netewiya xwe de can û darayiya xwe fîda dike û li rewşên dijwar de li tenîşta netewa xwe de ye ku her vê yekê jî kariye pîlanîn lipeyhev ên komara îslamî û yek ji wan sînemaya tejî çewtekariya vê rastî şikestê bike.

Gotina min ya dawî li vê derfetê de jî dikare eva be ku hekî Pêşmerge heta îro kariye bi ser hemû astengî û lemperên li ser rêya xebatê de bi ser bikeve ev ketwar û rastiye ku xelkê têkoşer û qehremanê Kurdistanê hertim pişt û penaha Pêşmerge bûne û ev bi erkek binyatiya xwe zanîne û her li pêwendîya dînamîka vê jî ye ku dijminê Kurd her tim jê biecîn e.

## Nerîna



**"Mela Bextiyar":**

**"Tevgera dîplomatîk a Serokwezîrê Herêma Kurdistanê bo Amerîkayê baş bû"**



**"Omer Çelîk":**

**"Piştî çekdanînê em dikarin bi hêzên Sûrî re rûnin"**



**"Donald Trump ":**

**"Em dê rê nedin Îranê ku uranyumê dewlemend bike"**



**"Sergey Ryabkov" :**

**"Ukrayna bi êrişên xwe yên li ser baregehên leşkerî yên hewayî yên Rûsyayê aloziyê zêde dike û got, "Em ji London û Washingtonê dixwazin ku bi awayekî bertek nîşan bidin da ku rê li ber aloziyên zêdetir bigirin"**

# Sê biryarên girîng ji bo zimanê Kurdî li Almanya!



**N. Eskender Ceiferî**




Dewleta nû ya Almanya wate dewleta Merz ku ji aliyê CDU ve pêk hatiye, dijatiya biyaniyan dike. Lê ji bo Kurdan cuda ye.

Di heyamên derbasbûyî de bi awayekî fermî 3 saziyên ser bi dewleta Almanya, ji bo parastin û xwedîderketin li zimanê Kurdî dest bi xebat û çalakiyan kirin.

Ya yekem ev e ku zanîngeha Kurdî li bajarê Drêsdên ê Almanya tê vekirin. Ev ji zû ve xwesteka çalakvanên Kurd li Almanya bû. Çendîn salan kar jê re hat kirin heya zanîngeha vî bajarî xwe ji bo vê xebatê berhev kir.

Biryareke din ev e ku Tora ragihandina pirrengî li Almanya karî heya dawiya 2026 bûdceyê ji xwe re ji dewleta Almanya bistîne.. Berê jî vê torê karîbû ji bo du salan pere bistîne.

Herwisa biryar hate standin ku êdî xelk bikare bawernameya ajotinê bi zimanê Kurdî derxîne. Ev jî piştî daxwaza xelkê ji bo beşdarîkirin di ezmûnan de bi zimanê Kurdî derket rojevê û hate pejirandin.

Ev çend sal bûn ku hejmareke çalakvanên Kurd ji dewleta Almanya dixwastin vê biryarê bistîne û niha jî bi pejirandina biryara dayîna ezmûna bawernameya ajotinê bi zimanê Kurdî, deriyên mezintir ji bo zimanê Kurdî têne vekirin.

Ji bilî vê, dana pere ji bo projeyên bi zimanê Kurdî jî li Almanya berfireh bûye.

Li bajarê Drêsdênê yê Almanya zanîngeha Kurdî tê danîn lê belê Kurd li Kurdistanê ji hebûna zanîngeheke Kurdî bêpar in. Biryar e ev proje heya 2026 bê bicîkirin.

Herwisa biryar e tora bi navê Tora Pirrengî, heya dawiya sala 2026 xebatê bike û piştre jî dibe ku careke din dewleta nû ya Almanya piştevaniya wê bike.
Belkî wek çawan faşîstên Tirk û Fars dijatiya danînna zimanê Kurdî ji bo Facebook û Google jî kiribûn, dijatiya van hewlên dewleta Almanya ji bo zimanê Kurdî bikin.

Lê van saziyan biryara xwe standine û di karên xwe de jî, ji bo zimanê Kurdî berdewam in. Ew dibêjin, bi pirrengiya mirovan û pirojeyên bi vî rengî, em xwe û hevdu bihêz û xurt dikin û rê didin ew mijarên me zêdetir li ber dest bin,Di salên derbasbûyî de li Almanyayê toreke rgaihandinî bi piştevaniya dewletê hate ragihandin ku tê de zimanê Kurdî jî li kêleka zimanên hin neteweyên din cih digire. Navê wê, Tora ragihandinê ya pirrengî ye!

Vê torê di daxuyaniya xwe de ji xeynî zimanê Almanî, cih daye pênc ziman-an ku Fransî, Erebî, Ingilîzî, Kurdî û Potrogalî li xwe digire.

Di daxuyaniya destpêkê ya karên vê torê de hatiye: Em çalakvanên ragihandinê bi pêşîneya koçberî yan jî penaberiyê ne û hertim hest bi rastgirî yan jî nijadperestî û newekheviyê dikin. Li ser me gelek tê axaftin lê belê ne bi me re.

Em xelkê bi pirojeyên ragihandinî re li hev girê didin û dengê xwe hildidin û destêwerdanê dikin. Em bi perwerdekirin û lihevguhertina nerînan, hevdu xurt dikin. Emê bikarin ji bo her kesî toreke cûrbicûr û pirreng biafirînin.

Girîngiya vê torê ji bo Kurdan ev e ku zimanê Kurdî jî, li kêleke hin zimanan cih girtiye ku xwedî dewlet in û di asta navdewletî de jî têne bikaranîn.
Ew dixwazin civakeke pirreng li vir pêk bînin. Lê ji ber ku ev cara yekemîn e saziyek ku bi piştevaniya dewletê tê avakirin û li zimanê Kurdî jî xwedî derdiekve, Kurdên Almanyayê jî pêşwaziya wê dikin.

Erê, rast e û Ewrûpî dizanin êdî Kurd bûne beşek ji rastiya Rojhilata Navîn. Lewma jî ew Kurdan û zimanê wan, derbasî nav pirojeyên bi vî rengî dikin û dibêjin pirrengiya pêşîneya me, me derbasî nav rewşekê dike ku bi nerîneke cîhanî, lêkolînê li ser encamên niha, piroseya koçberî û penaberiyê û herwisa stratejiyên siyasî û netewî bikin. Û bikariin karên perwerdehiyê bikin. Me bi ekterên saziyên penaberan û hinek saziyên din ên civakî re pêwendiyeke baş heye ku piştevaniya me dikin.

Em vê torê weke odeyek ji bo hemû mirovan jî binav dikin ku dixwazin ezmûna xwe li ser kiryarên newekhevî parve bikin bêy ku rastî êrîşê bên yan jî li ser kesatiya xwe biaxivin.

Dawiya daxuyaniyê jî, wan basa perwerdekirina rojnamevanan kiriye û dibêjin, di riya vê torê re, em dikarin pêwîstiyên têknîkî, madî û rêkxistinî pêk bînin ji bo ku bi pêkhateyên cuda yên rojnamegeriyê hem hevdu perwerde bikin û hem jî bêne perwerdekirin. Bi vî awayî jî wê bi pirrengiya reftaran, karên me yên hevpar, hevbendiya me û lihevguhertina nerînan bi awayekî giştgir bihêz û xurt bibin.

# Gola Urmiyê ber bi jinavçonaê ve diçe



**N. Rojan Sofîzade**



Mixabin gorî dawî raporan gelek zehmete ku Gola Urmiyê ji navçonê xelas bibe, halê golê baş nîne û ber bi hişkbûna yêkcarî ve diçe û nefesên dawî dide.

Wan rojan dîsan mijara nîgeranî ji mirna Gola Urmiyê bûye bûye sedemê kelêjan û dilequtka xelkê xemxor û bi taybet xelkê parêzgeha Urmiyê û derdora vê.

Ger cehdek bo xelaskirina gola Urmiyê ji hişkbûnê neyête dan ku li rastî de çi hiviyek nîne ku taze bête vejandin, dê derencamên gelek cihê nîgeraniyê li pey xwe bi cî bihêle, dê jiyana mirovayetî û jîngeh û jiyan bikeve ber metirsiyê û ji hemiyan girîngtir, li cihê ava Golê, dê deçtekî mezin a xwê bi cî bimîne.

Gola Urmiyê bi sedema gendelî û neşiyana karbidestên rêjîmê ber bi jinavçonê ve diçe.

Li demekê de ku karbidestên rêjîmê, dehan sal e bas ji îradeya xwe bo zindîkirina gola Urmiyê dikin, mixabin ev gola nefesên xwe yên dawî dikêşe.

Zindîkirina gola Urmiyê bûye qurbaniyê sozên bê binyat, gendeliya sîstematîk, nebûna dîtingeha zanistî û neşiyana birêveberên rêjîmê.

Li berdewamiya vê rewşê de li paşerojek gelek nêzîk de gola Urmiyê dê bi tevavî jinav here û dever dê rastî bahoza xwê û koçberiya bi neçarî ya berfireh û jinavçona werzêrî û qeyrana tendirûstî bibe.

Hişkbûna gola Urmiyê metirsî û pir krîzî li ser mirov û erdnîgariya navçê diafirîne ku dê lêkeft û bandor ev bin:

- Guherîna kêş û hewayê navçê ku keş û hewayeke hênik û xweş e ye bo cihê hewayê gerim û serhildana bav û bahozan ku dibe sedema guhertinan di demografiya jîngeha navçê bi panahiya zêdetir ji 500 kîlometran.

- Zêdebûna nexweşiyên bi taybet curên penceşêr, nexweşiyên çerm, bi sedema hewayê qirêj û jehrî.

- Valabûna gund û bajaran û koça bi neçarî zêdetir li 13 milyon xelkê rûniştiyên vê navçê bi sedema barîna xweyî û barana şor.

Gola Urmiyê hem bi mebesta geştyarî û hem çareseriyên bîjişkî û dermanî, û pêşwazîkirina li geştyareke zêde û naha jî bi sedema xemsarî û nebûna siyasetên guncaw yên jîngehê, bûye metirsiyeke mezin bo ser canê mirovan û li ber egera ji navçûnê de ye û xelkek zêde dimirin an rastî astengî û koça bi naçarî dibin û di dawiyê de dibe sedema koma arîşeyên siyasî û civakî û ... hwd.




Demekê ku behs ji nebûna siyasetên jîngehî û nebûna rêveberî û sûdwergirtin ji zanistê tê kirin, ya ku rêveberên Komara Îslamî hewl didin bi birêveberina pilanên seqet û nezanistî, krîza hişkbûna gola Urmiyê bi afrandina krîzeke din di navçê de çareser bikin!

Di heyama çend salên derbasbûyî de ku pirsa hişkbûna gola Urmiyê hatiye holê, hikûmetê soza cîbicîkirina çendîn planan bo veguhastina avê li cihên din bo gola Urmiyê dabûn ku hemî cehd û sozên wan direv û bê bingeh derkevtin.

Tenê pirojeyek ku ev li ser xebitîn, veguhastina ava çemê Zê ya biçûk bû ku li Rojhilatê Kurdistanê û li bajarên weke Serdeşt û Pîranşarê hilkeftiye.

Hikûmet di vê navçê de bi lêdana 45 bendavên mezin û biçûk li ser rûbaran û çavkaniyên sereke yên vê deverê û her weha lêdana tûnela veguhastina avê bi dirêjahiya zêdetir ji 40 kîlometran di bin erdê de, di helwa veguhastina avê ye bo gola Urmiyê, ne tenê çi alîkariyek bo pêşîgirtin ji hişkbûna gola Urmiyê nekir, belku gelek xisar jî gîhande jîngeh û çavkaniyên ava deverê jî.


Ev yeka di demekê de ye ku, jîngehparêz û xelkê bajarên Serdeşt û Pîranşar helwest girtin û dijberiya vê pirojeyê kirin û dengê nerazîbûna xwe gihandin bo navendên hikûmetê, lê mixabin ti bersivek wisa ji wan re nehat dan.

Niha ku dîsan zenga metirsiya çikbûna yêkcariye gola Urmiyê tê bihîstin, gorî siyaset û kiryarên rêjîmê, nabe tu kes benda cehda rêjîmê be ji bona rizgarkirina vê golê, belku di rastî de ev gola bû qurbaniyê dujminayetî û siyaseta kavilkariya rêjîmê digel xelk û jîngeha wê deverê.

# Rejîma Îranê û siyaseta terorê



N. Hesen Mukerem



Komara Îslamî ya Îranê bi kiryarên terorîstî, girtin, îdamkirin û tunekirinê li dijî neteweyên bê maf, bi taybetî Kurd û Baloch, tê nasîn.

Di heyama 45 salan de, li her qada siyasî, civakî û çandî de Kurd negeheşiye mafên xwe, û berdewam rastî siyaseta teror, girtin û îdam hatiye.

Parlamentoya Ewropayê jî IRGC (Spaha Pasdaran) bi sûçê tepeserkirina nerizayetî û xwenîşanderan, girtin û îdamkirina ciwanan wek sebebkarê komkujî û terorê destnîşan kir.

Girtin û îdamkirina Kurdan û neteweyên dinê ên bindest û bê maf wek Belûç, Ereb, Turkimen, Azerî û kêmaniyên dinê di siyaseta Îranê de cihê girîng hene, û gelek kes bi sedema şer, şîroveyên siyasî an jî bi sedemên mafparêzî hatine îdam kirin an girtin.

Di demê protestoyan de, gelek mafparêz û azadîxwaz, bi taybetî ji kêm neteweyan, hatine girtin û an jî hatine îdam kirin.

**Rejîma Îranê bi îdam û girtinê dixwaze gelê kurd bifetisîne an tune bike herçend, tunekirina Kurdan û neteweyên kêm di siyaseta fermî ya Îranê de heye, ku mafên zimanî, çandî û siyasî yên wan hatine zeft kirin û rê wan hatine asteng-kirin.**

Di warê çandî, ziman û azadîxwazî de mafê Kurdan bi siyaseta tunekirinê û terorîstî hatiye binpêkirin, bi wî away dixwaze kurdan tune bike û Gelek kiryarên terorîstî yên rejîma Îranê li dijî Kurdan hene, ku di nav wan de:

• Qirkirin, kuştin û îdamkirin: Belge hene ku li Rojhilatê Kurdistanê rejîm bi şer, qirkirin, kuştin û îdamkirinê li dijî gelê Kurd dest pê kiriye, ku hemû zagon û qanûnên navneteweyî tê de binpê kirin.

• Koçberkirin û talan: Di çarçoveya siyaseta terorîstî de, Kurd bi zor hatine koçber kirin û mal û milkên wan hatine talan kirin

• Bêexlaqî û astengkirina mafên medenî: Rejîm bi kiryarên bêexlaqî, astengkirina mafên medenî û rênedana mafparêzî yên Kurd, terorê bi awayek fermî berdewam dike.

Ev belgeyan nîşan didin ku siyaseta terorê ya rejîma Îranê li dijî Kurdan, bi şêweyek planî û sistematîk, bi şiklên qirkirin, koçberkirin, kuştin û îdamê hatiye lidarxistin.

Rejîma Îranê mafxwaziya kurdan bi awayek terorîst tîne belgekirin, çimkî ew dixwaze her têkoşîn, daxwaz û xebata mafparêzî ya Kurdan wekî "terorîzm" nîşan bide, da ku:

• Daxwazên siyasî û mafparêzî yên Kurdan bêqedr û bêqanûn bibin:
Bi vî rengî, her çalakî ya azadîxwazî an mafparêzî yên Kurd tê têkoşîna terorîstî ve girêdayî dike, da ku wan bi qanûn û zorê kontrol bike an tepeser bike.

• Çima dewleta dagîrker ya Îranê ev qas tirs û xof li kurdbûnê heye?
Ji ber ku têgihiştina maf û azadîyên Kurd dikare rewşa siyasî ya dewletê kirîzdar bike.

Rejîma Îranê bi têgihiştina mafparêzî wekî terorîzm, dixwaze civaka Kurd hov nîşan bide û kontrol bike.

Wirda nakokiya siyasî û çandî jî heye: Siyaseta bindestiyê, cehda helandin û jinavbirin û tunekirina mafên zimanî û çandî yên Kurd, sedem dibe ku gelê Kurd zêdetir bi cezayên qirker û îdamê re rûberû bibin.

Ev faktorên siyasî, dîrokî, aborî û civakî, di bin siyaseta kontrolê û tirsandina rejîmê de, sedema zêdebûna îdamê di bajarên Rojhilatê de dikin.

**Di dawiyê de**

Kurdbûn dijware: Siyaseta terorê dibe sedema zêdebûna dijwariya kurdbûnê, lê di heman demê de, ev dijwarî dibe sedema xurtbûna têkoşîna mafparêzî û azadîxwaziyê.

Encama giştî ew e ku siyaseta îdam û girtinê ji aliyê rêjîma komara îslamiya Îranê ve li bajarên Rojhlatê Kurdistanê de, herçend dixwaze mafên kurdan binpê bike û têkoşîna wan rawestîne, lê di rastiyê de dibe sedema zêdebûna hişyariya neteweyî, xebatên medenî û têkoşîna mafparêziyê di nav gelê kurd de.



# Kê bextewer e?



**N. Vênûs Fayîq**
**W. Hesen Mukerem**



Ji dema ku ev mirovê nefretlêkirî ji bihuştê hatiye derxistin û şandin ser erdê ve, ew li pey tiştekî ku navê daniye bextewerî digere ku jê re digot Bextewarî hîn jî ne diyar e, ew çi ye, çawa tê ravekirin û çi pênaseyekê bidinê.

Gotina herî ecêb ku min heta niha li ser "bexteweriyê" xwendiye, ya "Gotav Flaubert" , xwediyê Madame Bovary ye:

"Ehmeq, xweperest û xwedî tenduristiyeke baş sê tişt in ku ji bo bextewarbûnê hewce ne," wî tekez kiriye gotiye bi bê ehmeqbûn tiştek hebûna wê tune ye..

Flaubert, ku wekî nivîskarekî "objektîf" tê hesibandin, ez difikirim ku wî ev yek dema ku ji nexweşiya derûnî dikişand gotiye, wekî din zehmet e ku bextewariyê - heke hebe - bi bêaqiliyê ve girêbide.

Ji ber ku ehmeq dikarin li ser têgehek mîna "bextîyarî" biaxivin û wê pênase bikin - eger ew bikaribe were pênasekirin - bi mantiqa ehmeqan.

Ji ber ku wî bi rastî ehmeqî pênase nekiriye da ku em bikaribin herdu têgehan bi hev ve girêbidin.

Lê nîqaşa min li vir ne li ser asta takekesî ye, her çend ez dixwazim li ser asta kolektîf berfireh bikim.

Ji ber ku takekesek "bextewar" di jiyana kolektîf a civakekê de, lê di malbata xwe de jî tiştekî naguherîne.

Lê gava ku civakek nîşanek "bextewariyê" hebe, ew bi awayekî di jiyana mirovan de jî xuya dike.

Li gorî Rapora Bexteweriya Cîhanê, ku salane ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve tê amadekirin, pîvanên "bexteweriyê" ji bo danîna welatekî di rêza welatên bextewar de ev in: kalîteya polîtîkayên rêveberiya welêt.

Her wiha girîng e ku ji bo pîvandina asta bexteweriyê li her welatekî, divê hûn pêşî asta "bêbextiyê", sedemên wê û bandora siyaseta rêveberiyê li ser mijarê destnîşan bikin.

Pîvanên din ên NY ji bo destnîşankirina bextewariya welatan ev in: temenê navînî yê jiyanê, xweş derbasiya civakî, cûrbecûr derfetên jiyanê yên berdest ji bo kesan di hemû warên civakê de, asta nizm a gendeliyê, kêmkirina newekheviyê di navbera welatiyan de di hemû astan de û astên edaletê. Hilberîn/veberhênan dest dikeve..

Ji bo kesên ku li tiştê ku jê re "bextewerî" tê gotin digerin, ne qasa pereyê di berîka wan de ye, ne milkê li ser navê wan e, ne jî xuyangê wan e, otomobîla ku ew diajon û ...hwd

Belkû, bi baweriya min, "bextewerî" yek ji wan têgehên herî zêde tê texmînkirin e ku ji bilî bi awayekî kolektîf nayê pêkanîn, û pêkanîna wê meseleyeke rêlatîvîteyê ye.

Ji ber ku wekî dibêjin, hebûna pereyan bêyî tenduristiya baş we bextewar nake, û berevajî vê. Lê ev hemû hûrgulî ne di asta takekesî de.

Ji ber ku "bextewerî", mîna "azadî", ku min berê bi tabloyekê dişiband, puzzle ye.

Divê hûn hemî perçeyan bi hev re bikin da ku dîmen temam bikin û tiştê ku jê re "bextewerî" tê gotin bibînin.



# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Li heyva Gulan a 2025an de Zêdetir ji 163 girtî li girtîgehên rêjîmê de hatine bidarvekirin

Pêka rapora Hengawê, li heyva Gulan a 2025an, zêdetir ji 163 girtî li girtîgehên rêjîmê de hatine bidarvekirin. Herwisa li vê raporê de hatiye ku, nasnameya tevaw a 157 kes ji van girtiyane hatiye eşkerekirin û nasnameya 6 girtiyên dinê li qonaxa lêkolînê de ye.

Pêka vê raporê, herî kêm 5 jin li girtîgehên rêjîmê li bajarên "Qezwîn, Damixan, Gurgan, Şîraz û Qizilhesara Kerecê de hatine darvekirin

Herwisa zarokek ê bi navê Mihemedriza Sebzî hatiye bidarvekirin.

ji tevahiya 163 girtiyên ku di meha Gulana 2025an de hatine darvekirin, tenê 6 halet di ragihandinên fermî yên rêjîma Îran û malperên girêdayî Dezgeha Dad a rêjîmê de hatine belavkirin. Herwisa sizayê darvekirina 4 girtiyan bi awayekî nihênî û bi bê agehdarkirina malbatên wan û mafê hevtîtinê hatiye cîbicîkirin.

Pêka vê amarê serhev wan bidarvekirinan de 37 girtî xelkê Rojhilatê Kurdistanê ji parêzgehên Sine, Kirmaşan, Urmiye, Îlam, û Luristanî bûne û 22 kes jî xelkê Belûç û 18 hevwelatiyên Azerî, 6 hevwelatiyên Ereb, 2 hevwelatiyên Tirkemen, 2 hevwelatiyên Gîlek û 7 kes ji xelkê Efxanistanê û 11 kesên nenaskirî li heyva Gulanê anku 11ê Banemerê heta 11ê Cozerdanê hatine bidarvekirin.




## Kuştina xelkê Belûç, wekî komkujî û jinavbirinê berdewam e

Komkujî û qirkirina gelê Belûç ji aliyê rêjîma Îranê ve bi awayekî tirajîk bi rê ve diçe û mixabin dunyayê li hember jinavbirina gelê Belûç de çavê xwe danane ser hev.

Şev û roj di nava bajar û gundan de xelkê didne ber teqê, bê rehmane şewatberan dikujin û agir berdidne laşê wan, rojane xelkê û jin û zarokan direvînin û cinayet û desdirêjiyê dikne ser wan, kêm roj heye çendîn Belûç li girtîgehan de neyêne bidarvekirin û heta termê wan jî radestî malbatên wan nakin, rojane çendîn gund û malên xelkê bi lodêran xirab dikin û xelkê bi zorî koçber dikin. Tewawî nawçên Belûçistanê wekî meydana şerê 2 welatan, bi tang û top û hêza serbazî hatiye tejî kirin, û bi giştî jiyan û xizmetguzarî livê çinîne.

Roja Sêşemî 13ê Cozerdanê, girtiyekî Belûç ê bi navê Mecîd Bêhzadî xelkê gundê Miyanderanê ser bi bajarê "Zêhkulot" li girtîgeha rêjîmê li bajarê "Menûcan"ê, hate bidarvekirin.

Herwisas li 11ê Cozerdanê, "Sadiq Şehnewazî", naskirî bi "Exter", kurê Cehangîr û "Emîrhusên Şehnewazî" kurê Quddûs, li rêya Pehre-Bizpîran"ê de ji aliyê kesên nenaskirî ve hatine kuştin.

Herwisa li vê rojê de bi sedema bûyera hatinûçonê li gundî "Kelanî" ser bi bajarê "Deştiyarî"yê, şewatberek ê bi navê :"Nûrmihemed Dilşeb", kurê Misafir, canê xwe ji dest da û "Ebdullah tarac" kurê Qadirdad, jî li vê bûyerê de birîûndar bûye.

Herwisa Fexrullah Şîrozîhî yê temen 30 salî kurê Xulam û Îbrahîm Liceyî" temen 35 salî kurê "Ebdulhemîd" li girtîûgeh arêjîmê li bajarê "Bem"ê de hatine bidarvekirin.




## Qedera çendîn welatiyên binçavkirî piştî derbasbûna zêdetir ji heftiyekê hêj nerohn e

Piştî binçavkirina xoserane û bê belgeya yasayî, ya 5 welatiyên xelkê bajarê Seqizê û 2 welatiyên xelkê bajarê Banê , li 4 û 5ê Cozerdanê, qedra wan welatiyan her bi nerohnî maye.


Piştî derbasbûpna zêdetir ji heftiyekê ji binçavkirina 5 welatiyên xelkê bajarê Seqizê yên bi navên "Hîwa Ehmedî, Soran Sultanî, Rehîm Qudretî, Mihemed Zebîhî û Idrîs Elîmihemedî" qedra wan welatiyan her bi nerohnî maye.

Ew girtiyane li êrîşa xoserane û hovaneya hêzên îtilaata rêjîmê bo ser malên wan li bajarê Seqêzî de bi awayekî tundîtîj hatiner binçavkirin.

Herwisa qedera 2 welatiyên xelkê bajarê Banê yên bi navê "Saman Kerîmî", girtiyê berê yê siyasî û hevjîma wî "Ferzane Reşîdî" piştî derbasbûna zêdetir ji heftiyekêhê bi nerohnî maye.

Saman Kerîmî li şeqameke bajarê Banê û hevjîna wî, Ferzane Reşîdî" li êrîşa xoseraneya hêzên îtilaata rêjîmê bo ser mala wan, hatine binçavkirin.


Heta belavbûna vê nûçeyê, sedema binçavkirina xosearne û bê belgeya yasayî ya wan welatiyên Kurd, û herwisa tohmeta sepandî bi ser wan û cihê ragirtina wan jî nehatiye zanîn.



# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (495)


# Tolhildan

**ji bo bîranîna Şehîd Şapûr Fîrozî**

**Toldilderê xwîna 59 ciwanên Kurd yên bajarê Mehabadê**

Partiya Demokrat A Kurdistana Îranê
Navenda Ragihandinê